- Gotinên xav napijin bê tav / helbest / 1981/ Almanya /, helbestên vê dîwanê hêja Hemereş Reşo ji kovarên Hawar û Ronahiyê daye hev û pêşgotina xwe û pêşgotina Dr.Nûredîn Zaza çap kir .
- Elîfbêya Tekûz / 1982 / Şam .
- Çar Leheng / têkest / 1984 / Şam .
- Berseva Hoşeng / 1992 / Şam .

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Ebas Isma'îl Xalê Nivîskar Û Rewşenbîran ji Bûyerpress re axivî û got: Berî ez bi Kurdî binvîsim min guh dida Selîm Berekat.. Qenciya min li ser wî heye

- Em ji gund dihatin bajarê Qamişlo ji bo em li dijî Edîb Şîşeklî derkevin xwepêşendanan, Sînem qîza Seydayê Cegerxwîn rêvebira xwepêşendanan bû.
- niha mixabin rojnamegerî bûye bazirganî berê rojnamegeriya Kurdî ji niha xurtir û aktîv tir bû.
- Geşbîn im ku para me Kurdan wê hebe, lê mixabin Kurd di vê derfeta zêrîn de ji welatê xwe direvin.
- Ferhadê Icmo di helbesta stranî de li ser asta Kurdistanê de, yekemîn e.
- Banga min ji nifşê nû re ku ew şano û romanê binivîsin.
- Aşek li ser çemê "Çexçexê" hebû, jiber ku dengê çexçexê jê dihat navê aş û çem bû çexçex, û carê diya min û jinê gund ji hev re digotin: "Em sibe diçin aşê Çexçexê em ê arvanê xwe bihêrin û em ê ji xwe re barek qamîş jî binînin ji xwe re bikin 'erzal".
- Ez yekemîn nivîsakar im ku min Ii ser "Angoraz di meteloka Kurdî de" nivîsandiye.
- Di sala 1946an de li ser riya Hesekê Odak biçûk hebû jê re digotin "Oda Intacê" çi kesê ku ji gundan tiştek anîbana bajêr ji bo firotinê bace jê distandin, anku satilek mast bihata bajêr baca wê distandin.

Hevpeyvîn: Qadir Egîd

"SeydayêCegerxwîn destê min girt û ez birim dibistana Suriyanan û ji rêvebirê wê Henna Mûrê re got: "Ez dixwazim hûn vî şagirtî di dibistana xwe de tomar bikin". Yê rêvebir ji Seydayê Cegerxwên re got: " Seyda tu dizanî ku em nikarin Misilmanan di vê dibistanê de qebûl bikin, jiber ku hin wane hene olî ne, û bi ola me ve girêdayî ne, û ji xwe nimêj jî hene û şagirtên me diçin Dêrê wan nimêjan dikin"!! Cegerxwîn jê re got: " Wê bi hevalê xwe re waneyên olî jî bibe, û wê here dêrê jî û wê nimêjê jî bike"

Navê min Ebas Ibrahîm Isma'îl e, di sala 1938an de li gundê Sada ku dikeve rojavayî bajarê Qamişlo û dûrî bajar bi 10KM an e ji dayik bûme. Wek li hemû deverên Kurdan dibistan tune bûn, min Qur'an dixwend heta di sala 1955an dewleta Sûriyê dibistan di gelek gundan de vekirin û ji wan jî gundê me bû, mamosteyê me ji bajarê Hemayê bû, ez tevlî dibistanê bûm, ji ber ku min Qur'an xwendibû, diya min

ez danîbûm li ber destê Melê, lê jina Melê ders didan min jiber ez delalî bûm û diya min mast, nîvişk û hunguv dida wan, yê Mele ez nedixistim nav suxteyan "Şagirtan" de. Mamostê dibistanê, ez jîr didîtim, yekser ez ketim pola duyem de, lê heroj dihat serê xwe bi tepa, min hemû pirtûk û nivîs jê re dixwendin lê min nizanîbû pê re bi zimanê Erebî baxivin, ne lefzek jî, ez mam di wê dibistanê de heyanî ku min Sentefîka stand.
Min li gund zarotiya xwe bûrand, gundê me jî mîna hemû gund û deverên Kurdan bû, em jixwe re dilîstin hin lîstok hebûn wek" Xar û kab, Çirê, Yabo Yadê Xezalê" û li ser bêndera gund me nîv roja xwe dibûran, her wisa jinan jî karê mala xwe dikrin û mêr jî hin hebûn karê wan hebû û hin jî bê kar bûn. Ji xwe ode bi şev ji zilamê gund tije dibû û li ser hemû tiştî daxivîn û lîstkên wan jî hebûn û pir bûn mînak wek "Hinkolîskê".
Ez wehîdê dê û bavê xwe bûm, rewşa me li gund baş bû, pezê û mêşê me hebûn, anku di aliyê abûrî de halê me xweş bû, li gundê me jiyan bi aştî û aramî derbas bibû, ew bûyar û tiştê balkêş tune bûn, hemû rojên me wek hev derbas dibûn, ez van tiştan dibêjim jiber ku ji civaka me ya Kurdên Rojavayê Kurdistanê ne, û ji bo nifşê nû jî jixwer zanibe ku rewşa civaka me wek min di temenê xwe de dîtî ku berî 75 salan çawe bû! Wek min diyar kir ku bûyerên balkêş tune bûn lê dibe ku wî heyamî wek nimûne ev bûyar balkêş be:

Şêxek ji nav Zîla hatibû gundê me, navê wî Şêx Behadîn bû, vê dawiyê navê wî bû Şêxê Doda, Xort û keçê gundê me hemû ji Şêx re bûbûn mirîd û ji wan jî ez, destê me û keçan dixist destê hev de, û digot çavê xwe bigrin û berê xwe bidin "Başûr" û zikrê bikin! Bi rastî ev bûyer ji bala min naçe, anku çawe şêxekî oldar û di wî heyamî de destê qîz û xortan dikirin destê hev de ji bo zikrê, hetanî vê çaxê jî ez difikirim çima berê me dida "Başûr" gelo jiber ku Başûrê Kurdistanê bû anku di wî heyamî de şoreş ji bo gelê Kurd rabûbûn!?
Wek min diyar kir, ez ferhadê "wehîdê" dê û bavê xwe bûm, di tmenek pir biçûk de ez zewicîm, temenê min 15 sal bûn, keça amê min ji min re kirin bûk. Gundê me nêzî sînorê Tirkiyê bû rojane gundî û xelkê deverê diçûn Bakurê Kurdistanê û dihatin, sînor di wî heyamî de sist bû ne wek niha teyrek nikare derbas bibe, ez bixwe di sala 1949an de gelek caran bi meşê diçûm gundê Mendelê û dihatim.





"Tê bîra min, helbestek hat ji min re, xwediyê wê ji Dêra Zorê bû, min jê re neweşand ji ber ku asta wê nizim bû, hate serê xwe bi tepa û digot: Çawe yekî Kurd li hebesta min vegere û neweşîne".

Di sala 1955an de min sentefîka ji dibistana gund stand, û ez hatim bajarê Qamişlo, min 2 mehan li dibistana "Omer Bin Xetab" xwend, li wir xwendin ne bi dilê min bû, ne tekûz bû, jiber ku ez komonîst bûm, ez çûm mala Seydayê Cegerxwîn min jê re got ez rehetiya xwe li vê dibistanê nabînim, xweska ku tu min bibî dibistana Suryanan, perê me hene û ez dixwazim li wir xwendina xwe bikim. Seydayê Cegerxwîn destê min girt û ez birim dibistana Suriyanan û ji rêvebirê wê Henna Mûrê re got: " Ez dixwazim hûn vî şagirtî di dibis-



tana xwe de tomar bikin". Yê rêvebir ji Seydayê Cegerxwên re got: " Seyda tu dizanî ku em nikarin Misilmanan di vê dibistanê de qebûl bikin, jiber ku hin wane hene olî ne, û bi ola me ve girêdayî ne, û ji xwe nimêj jî hene û şagirtên me diçin Dêrê wan nimêjan dikin"!! Cegerxwîn jê re got: " Wê bi hevalê xwe re waneyên olî jî bibe, û wê here dêrê jî û wê nimêjê jî bike" Yê rêvebir ji min pirsî: Tê waneyên ola me bibî, û here dêrê?. Min got belê ez ê waneyan bibim û herim dêrê jî û hemû nemêjan jî bikim.

"Celîlê Celîl ji min re got: Nabe ku tu bi zimanê Erebî binvîsî, berê xwe bide zimanê Kurdî" Min erê kir û ji wê salê ve, ez bi zimanê Kurdî dinvîsim û hetanî vê çaxê min 20 pirtûk bi zimanê Kurdî weşandine".



Ez qebûl kirim û min bawernameya xwe ya amadayî ji wir stand.
Li bajarê Qamişlo jiyan ne wek li gund bû, bajarekê biçûk û pir xweşik bû, berî ku ez werim li Qamişlo xwendinê bikim, kemyon dihatin li gundê me Doda Qûm dibirin û Qamişlo pê ava dikirin, ez carna bi wan re dihatim bajêr, hîn Ferensa li vir bû, xelk li ser bênderan bû, deng û qerebalix pir ji bajêr dihat, aşek li ser çemê "Çexçexê" hebû, jiber ku dengê çexçexê jê dihat navê aş û çem bû çexçex, û carê diya min û jinê gund ji hev re digotin: Em sibe diçin aşê çexçexê em ê arvanê xwe bihêrin û em ê ji xwe re barek Qamîş jî binînin jixwe re bikin 'erzal". Lewma navê çem bû çexçex, newek ku niha jê re dibêjin "Ceqceq" Jixwe di heyamê berî aş de navê çem "Bû Nisra" bû. Jixwe navê bajar ji giyayê Qamîş hatiye "Qamîşliyê".. Ji riya ku diçe Hesekê û tê Amûdê û bi aliyê Rojava de jî yek xanî jî tune bû, vê dawiyê Miradê Îsa li cihê ku niha naskiriye bi navê "Camiya Qasimo" xanîk jixwe re ava kir, li nêzî cihê xaniyê mala Sara nadîk hebû, li wir jinên Ferensiyan xwe davêtin avê de" Havîngeha wan bû". di sala 1946an li ser riya Hesekê Odak biçûk hebû jê re digotin "Oda Intacê" çi kesê ku ji gundan tiştek anîbana bajêr ji bo firotinê bace jê distandin, anku satilek mast bihata bajêr baca wê distandin, ew bace ji şaradariya Qamişlo re bû.
Di sala 1959an de min bawernameya "Birovê" ya amadeyî li vî bajarê xweşik stand, paşê li bajarê Hesekê beşê "Mala Mamosteyan" Ji me re em 34 şagirt bûn vebû.
Ez di temenê 15 salî bûm hevalê partiya Komonîst, em ji gund dihatin bajarê Qamişlo ji bo em li dijî Edîb Şîşeklî derkevin xwepêşendanan, Sînem qîza Seydayê Cegerxwîn



rêvebira xwepêşendanan bû, digot: "Birûxe Şîşeklî" me lê vedgerand, û êdî kum sor dihatin me û em direviyan. Wê çaxê partî tune bûn, û me digot em ê mafê xwe di





riya Komonîstan de qezenc bikin. Jiber ku Cegerxwîn navdartirîn Kurdê bajêr bû, û komonîst bû, û bîr û baweriya me bi vê partiyê û Cegerxwîn dihat, rojane em li civata Cegerxwîn bûn, xelk gelek dihatin mala wî. Di sala 1955an de hinek xortê Kurda "Komela Ciwanên Kurd" ava kirbûn, navê wan jî tên bîra min: Derwêşê Mele Silêman, Samîyê Namî, Ebdul'ezîzî Ebdê, Kin'anê Eliyê Yûnis".. Komonîstan ji me re digotin ev hevalê" Hilif Bexdad in" ku ew gotin tê bîra min ez li ber xwe dikevim, paşê di sala 1957an de yekem partî ji bo gelê Kurd di Sûriyê de hat damezrandin. Di sala 1973an de çaxa ku rêjîma Be'es Erebê Xemir anîn herêma me min ji Komonîstiyê qera tê bîra min ji min re gotin: Ebas ji roja pêşî de wek Kurdekî netwe-



perest difikirî"
Min li bajarê Hesekê xwendina xwe berdewam kir, li wir ereb, xiristiyan, Kurd, em bihev re bûn, min ji xwendina pirtûkan hez dikir, ji wir min xwest ez binvîsim, rêvebirê mala mamosteyan xwest ku em kovarekê derxin yekser ez bûm sernivîserê wê û hevalê min ji Amûdê Se'îdê Golo bi min re bû, me navê kovarê kir "Alqelem" Pênûs, min nivîsên xwe û hevalê xwe di wir de diweşandin. Di wî karî de ez pir pspor bûm, tê bîra min helbestek hat ji min re xwediyê wê ji Dêra Zorê bû, min jê re newesand ji ber ku asta wê nizim bû, hat serê xwe bi tepa û digot: Çawe yekî Kurd li hebesta min vegere û neweşîne". Min nivîsê xwe ji Izgeha Qahîrayê beşê Kurdî re dişand di bin navê "Ebas Sercîhanî" Min bi helbesta zarokan dest pê kir, nivîsê min hemû bi zimanê erebî bûn. Di sala 1982an de Profîsorê Kurd ê navdar Celîlê Celîl bû mihvanê min qederê mehekî ma li mala min. Ji min re got: Nabe ku tu bi zimanê erebî binvîsî berê xwe bide zimanê Kurdî" Min erê kir û ji wê salê de ez bi zimanê Kurdî dinvîsim û hetanî vê çaxê min 20 pirtûk bi zimanê Kurdî weşandine.
Ez evîndarê filiklora Kurdî me, min gelekî xepartin di kultûr û filiklora Kurdî de kiriye, bi hezaran cîrok û metolokên Kurdî min dane hev û min weşandine, Ez yekemîn nivîsakar im ku min Ii ser "Angorazê di meteloka Kurdî de" nivîsandiye, anku metelokek heye tê gotin lê amaja wê û wateya wê watak



din e. Niha projeyek min pir mezin heye û pir kedê dixwaze, ez li ser kar dikim ew jî li ser " Qerf û tinazî di toreya Kurdî de" heta vî temenê 80ê salî jî ez dinvîsim û mineta Celîlê Celîl jibîr nakim. Bi saya nivîsandina Kurdî ez bûm hevalê Celîlê Celîl, Mûsa Enter, Çerkesê Bûyîk, Fetah Botanî, Diyar Doskî, Felekedîn Kakayî. Jixwe ez bûm endamê Pena Kurd jî.
Min di gelek kovar û rojnameyan de nivîsandiye wek: Kovara Pirs, Gurzek Gul, Jîn, Azadiya Welat. Hinek xortê wî heyamî min guh didan wan wek Konê Reş, Dirwêşê Derwêş, Nisredîn Ibrahîm, jixwe kurê min jî profîsor Farûq Ebas Isma'îl e, û ez dixwazim vê jî bibêjim ku berî ez bi Kurdî binvîsim min



guh dida Selîm Berekat jiber min afrandin di xwestek û nivîsandina wî de didît qenciya min li ser wî heye.
Ez rojane li rex Cegerxwîn bûm, tê bîra min çaxa kesayetekî Suriyanî parçeyek "zemîn" 'erdê avakirinê diyarî Cegerxwîn kir, min û Derwêşê Derwêş ji kîsê xwe me derî û pencere ji xaniyê Cegerxwîn re çêkirin. Qet jî bandora nivîsandina helbestê



li min nebû, min 3 dîwanê helbestan çap kirine, hemû pesn in, ez wan nabînim helbset ez wan bi navê "Wek Helbest" dibînim. Lê di deryaye filiklora Kurdî de ez baş avjeniyê dikim.
Niha piştî temenê 80ê salî, min dixwest ku ez vî welatî û vî miletê perîşan di vê rewşê de nebînim, qeyranek mezin li Sûriyê qewimiye. Di sala 1957an de min pirtûkek xwendin navê wê" Xencer Isra'îl" bû, di wê pirtûkê de tiştê balkêş hebûn, nivîskarê wê Isra'îlî bû, desthilata Sûriyê ew pirtûk qedexe kirbû, wisa di wê pirtûkê de hatibû: Heta 60 salî bi pêş de divê dewle-





ta Isra'îl hemû hêza xwe bixe di bin xidmeta karê ku ji bo Sûriyê were parçekirin bike. Niha em di wî 60 salê ku ew dibêje de dijîn. Ez jî xwediyê wê baweriyê me ku wê Sûriyê bête parçekirin, û bi geşbîn im ku para me Kurdan wê hebe, lê mixabin Kurd di vê derfeta zêrîn de ji welatê xwe direvin. Ji bo şoreşê min dîwanek nivîsandiye bi navê " Dîwana Qehremana" Min li ser Şengal û Arîn Mîrkan, û Kobanê hûnandiye.
Niha rewşa me ya wêjeyî di Rojavayê Kurdistan de tevlî hev e, gelek nav westiyane, ked kirine ji wan ez dikarim bibêjim ku Salihê Heydo yek ji wan kesê ku bi demek dirêj daye pêşiya me, ew samanekî Kurdistanî ye, Konê Reş pir ked kiriye, Mehemûd Sebrî "Evîndarê Xemgîn" Dilawerê Zengê, Dildarê Mîdî, Dildarê Aştî. Dixwazim vê bibêjim ku Ferhadê Icmo di helbesta stranî de li ser asta Kurdistanê de yekemîn e. Me di riya rojnamegeriya partiyan û hin kovarin din nivîsên xwe diweşandin, lê niha mixabin rojnamegerî bûye bazirganî berê rojnamegeriya Kurdî ji niha xurtir û aktîv tir bû.
Di dawiya vê hevpeyvînê de dixwazim ji nifşê nû re bibêjim ku ew li ziman û filiklorê xwe miqate bin. Banga min ji nifşê nû re ku ew şano û romanê binvîsin, pirtûkxaneya me pir qels e. Hêviyek din jî di dilê min de heye, hîn ez sax ku ez zimanê Kurdî yê standird bibînim, eger ji min hat xwestin ez ê zaraveyê Bota , Xerza û Bişêriyan bikim lêvegerek ji Standirda zimanê Kurdî re. Spasya keda we di rojnameya Bûyerpress de dikim, hûn karekî mezin û bêhempa dikin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Îskê Mirinê Yan Tayên Nexweşiyê

"Heger ev giyanê berpirsiyariyê di ser pîvanên partiyan re neyin girtin, emê tûşî bobelat û fişarên mezin wekî li Şingal û Kobanê li rû dayîn û emê ber bi kîmeyabaran û jinosaid ve herin, ji ber ku şerê di heremê de tê kirin, hîna ji şerê cîhanê yê duyemîn dijwartir e".

Melevan Resûl

Gurkirina pêla pevçûn û rûxandinê li seranserî Sûriye, nemaze piştî rûxandina hewldanên pêkanîna aramiyê - heta radeyekî- ji hêla kiwalisyona navnetwî bi serkêşiya Emrîka û hevbendiya Rûsiya, ya tenê li ser vehesîna şer diyalog dihate kirin, hemû hêvî berba çûn, û doza miletên Sûrî ji çareseriya siyasî re ber bi kêşeyek mirovî ve herikî û ew jî berba çû,

Ev lîstoka navdewletî hem bi rêjîmê û hem bi opsizyonê, bi hostatî leyst û dileyze, xuya bû ku şoreşa Sûriye derewk nixumandiye û ekterên di pişt perdan de sûde ji mantelîta rêjîma totalîter wergirt û ajendeyên xwe xistin bazara wêraniya Sûriye wekî dewlet xwedan derfet, ango pirtikên rêjîmê şînhatibûn û pêwiste were pirtikandin, di encamê de welatek kavil û civakek rûxayî bê ser û ber, bi dehan sal nikaribe birînên xwe bide hev.

Niha miletên Sûrî gihane wê asta bêhêvîtiyê, êdî ew li jiyana xwe ya rojane digere, eve jî wê serpêhatiya kurdan a resen disepîne (îskê mirinê şanî bide, wê qîma xwe bi taya nexweşiyê bîn e).

Di vê derbarê de pêwiste em bala xwe berdin ser rola tevgera kurdî di van qunaxan de, ew dikarin çi bikin û çi mesajê bighînin destwerdana hêzên navnetewî û bibin fakterê çareserkirina kirîza Sûrî bi tevahî .

Ev dîmenê reşbîn û bêhêvî di tabloya siyasî de mirov dixe nava gomanan, hele rewş wê ber bi kuve here û encam wê çibin?.

Giringiya rola kurdî di van qunaxên hestiyar de xwe dide pêş, hem ji ber taybetmendiya doza kurdî di Sûriye de, di warê pênase û pejirandina hebûna wî, ji rexekî helwesta rikeberiya Sûrî, û helwesta rêjîmê ya neyênî ji rexê din ve, nemaze ku heremên kurdî hîna neketine nava cengeke etnîkî û olî de û heta radeyekî herêmên kurdî mane parastî ji tund û tûjîtiya hindurîn, lê beramberî vê yekê hîna nakokiyên mezin di nava cada kurdî de peyda dibin û ne yekrêzî fişarê li cavakê bi tevahî dike û bandorek neyînî ji pêşeroja miletê kurd re tîn e, her weha helwesta dewletên bi bandor ji doza kurdî di Sûriye de.

Kêmasiya mezin ya tevgera kurdî, hîna nekariye cudahiyê bêxe navbera xebat û tekoşîna li ser astê kurdistanî û peydakirina alternatîfa kurd wekî netew li ser xaka xwe û di hidurî Sûriye de, em di wê baweriyê de ne ku doza kurdî li hemû parçên kurdistanê hev û din tekûz dikin, lê nabe diruşmeya axaftina siyasî ji çavkaniyên kurdistanî û xweparastinê xwe bidin pêş,

Her çendî tevgera kurdî a leşkerî li pêşe û bizavek siyasî çalak heye, lê di warê diplomasî de, xebat bi têrê nake, hîna hilsengandina zilehêzên gerdûnî bi çavê şervanên baş wan dinerxînin, wekî çawa hêzên navnetewî kirîza Sûrî wekî kirîzek civakî û mirovî dibînin, wisa doza kurdî wekî doza netewek berxwedêr û xudan kêşe nedîtin e, eva jî girêdayî ye bi berjewendiya wan û têkiliyên wan bi dewletên herêmî re, bi taybet dewleta Farisî a veşartî û Turkiye ku li hember hebûna hemû destkeftiyên ketîn yan wê bikevin destê kurdan de.

Dagirkirina bakurî Sûriye ne yasayî ye û herdu leystikvanên mezin – Rûsiya û Emrîka-hevnêrînin di vê derbarê de, herdu rex li hêzek hindurîn digerin da projeyên xwe di riya wan re pêk bînin, li ser zemînê hêza kurdî tenha dikare bibe fakterê veguherînê ji hindur ve, ji lewra ev nêzîkbûn têne kirin û herdu rex dixwazin sûdeyê ji hebûna kurdan hem di Êraq û hem di Sûriye de bigrin.

Pîvanên navnetewî ji nirxandina rewşê re li ser du beşan belavin, yek hebûna leşkerî, du tevgera siyasî ye, heger herdu rex pêkhatî bin û tekûz bin, wê dûzana kêşanê bi pîvanên rast werin kirin.

Bi lavlav û gazinan daxwaz pêk nayin, li vir pêwistiya tevgera siyasî bi hêzek xudan rol û çalak heye, her çendî li ser hev kom be û mezin be, ew qasî wê di dîmenê paşeroja Sûrî de aktîf bin û xwedan rol bin, heger ev giyanê berpirsiyariyê di ser pîvanên partiyan re neyin girtin, emê tûşî bobelat û fişarên mezin wekî li Şingal û Kobanê li rû dayîn û emê ber bi kîmeyabaran û jinosaid ve herin, ji ber ku şerê di heremê de tê kirin, hîna ji şerê cîhanê yê duyemîn dijwartir e.

İslam û Rastî

Pêşeroj Cewherî

Berî ku em bi şêweyekî lêkolînanî şaristaniya islamê dabaş bikin, pêwîste dem û cihê tê de peyda bûye bê nirxandin.

Çîrok ji bajarê Mekka weke çavkaniyek bazirganiyê destpê dike. Bajarê Mekka navendek bazirganiyê ye, dikeve navbera derya sor "Hebeşê-Yamen", deverên kendavê û herêma Şamê de.

Hoza Qureyşî, hozek pûtpereste hêdî hêdî di bingeha sermayedariya bazirganî de, li ser bîra Zemzem cihê Ismaîl Elxelîl kurê İbrahîm û diya xwe lê bi cih dibin tê avakirin. Her wiha di gel olên cihû, Zeredeştî, Xiristyanî hinek baweriyên din jî hene. Li vê derê cara yekemîn perestgehek ava dibe û sê pût lê têne danîn" Ellat,Elmenat,El'eza". Selman Ruşdî di pirtûka xwe ya bi navê"Ayat şeytaniyê" de wiha dibêje:

-Muhemmed ji hoza Qureyşî, ji malbateke xizan ve tê jiyanê

Heta niha welatên islamî newêrin kesayeta Muhemmed û ola islamê têxin bi ronahiyeke sosyolojî de. Tu dibêjî qey tiştek heye naxwazin bê naskirin û ditirsin çaxa bê naskirin. Li gor nêrîna min, eger lêkolînên wiha dernekevin holê dê welatên misilman û rojhilata navîn bi şêwazekî gelemperî tim her û her wê bimînin cihê pêlîstinê dibin destê Amerîka û Israîl de.

Awrupa bi xwe dema dest bi şoreşa ronakbîrî kir, hingî li pêş ket, ji ber vê çendê eger rojhilata navîn tevgera ronakbîrî xweser nede destpêkirin ewê tu car neçe pêş. Bê guman bi şirovekirina kesayeta Muhemmed dibe ku şoreşa ronakbîrî destpê bike.

Muhemmed kî ye?

Muhemmed ji hoza "Ebdulmenaf Haşimî kurê Ebdullah e" ber hemberî parekê herdem bi karwanê bazirganî yê Xedîcê re diçe Şamê û tê, di vê derbarê de dikeve bin bandorek mezin ji rebendarên suryanî de, ji aliyekî din ve cihû dibin cihê navkokiyê, ji ber ku rolek bazirganî pir mezin dilîzin. Şokirina wî di gel Xedîcê rewşek nû bi xwe re tîne, ji ber ku Xedîcê bazirganek mezine û pir zengîne û jê fêrî gelek tiştan dibe. Di vê demê de peyva weke peyxemberê dawî li ser zimanan pir dihate gotin, ev peyv bi xwe cara yekemîn Xedîcê bi dengekî kur û pist di guhê wî de, jêre dibêje. Muhemmed bi xwe mirovekî agahdare, li ser rewşa hemî ola û baweriyên serdem û berî serdema xwe. Ew dibîne rewşa heyî ne pêkane ku karibe armanca damezrandina yekîtıya siyasî di nav welatên ereban de pêk bîne. Ji ber vê yekê xwe weke namzet ji bo rêbazeke nû bi piştgirî û destek dayîna Xedîcê dibîne û bi vî awayî cara yekemîn surûş wî agahdar dike û jêre dibêje" tu pêxemberî di sala 610' ê zayînê de. Li aliyê din herdû şahinşahiyên mezin û hevdem" Bîzens û Sasanî" ketine pêxîla hev de bi nakokiyên tund û tûj û ev yek ,rê li ber derfetek mezin ji bo Muhemmed vedike . Ola nû li ser navê gelê ereb û li ser nûjenkirina îdolojî ya cihûyatî li her çar aliyên cîhanê belav dibe. Piştî derbasbûna wî ji bo " Medîne Elminewere" di navbera xwe de peymanek civakî li gel şîniyên bajêr de çê dike û têde bercewendiyên hemû hozan tê parastin, ji bilî komikek ji çîna eristiqratî. Buhişta ku Muhemmed dabeşa wê dike dibin destê Bîzens û Sasanî de ye û dojeh bi xwe ew terzê jiyana kevnare û çolistana ereba ye. Di navbera buhişt û dojehê de û ji bo pêk anîna armancê xwe Muhemmed dest bi şerê hebûn û nebûnê dike.

Ji van hidekşerûcewşenanjî, evin:

1- Cewşena Uhiddi sala 625' de ye, Muhemmed têde birîndar dibe û apê wî Hemze tê kuştin.

2- Cewçena Elxendeq, Qureyşî û cihû yên Benî Qureyza 20 rojan Medîne dorpêç dikin, lê ji ber ba û baranê bi ser nakevin û vedigerin di sala 626' de yê zayînê

Piştî mirina Muhemmed û kuştina 'Elî' ew mirovê emîndar û bawermend û her wiha piştî komkujiya kerbelayê ku hemû endamê malbata Muhemmed têde hatin qirkirin, Dawî li isalma Muhemmed jî hat. Êdî islam dikeve destê eristiqratiya ereb de û malbata "mû'awiye" ev malbat û çîna eristiqrata bazirgan û sermayedarên ereb, ne bes welatê ereb, lê belê di sala 650 de hemû nîştimanên sasan û bîzens, bakurê afrîkayê û ta sînorê Qustentîniyê dikeve bin

destê wan de.

Bi kurtasî ji civak û bazirganên qonaxa klanan imperatoriyek gewremend hat avakirin, ji nîvgirava sîbîrya ta welatên endonîz û malîzya dixin bin destê xwe de.

Gelo evya hemû ji çi hat?

İslamê di destpêka xwe de, hemû civîn û rêxistinên xwe di mizgeftan de durist dikirin, gelo çima di dawiyê de mizgeft dibin cihê nimêj û merasîmên olî? Bi wateyek din, islam tevgerek siyasî ye, çima kirasekî olî li xwe kir?

Ji bo bersiv dayînê peyvek Marks bala min dikşîne, têde dibêje" eger çi tiştê li ber çavan û rastî weke hev bûya, hîngê wê pêwîstî bi zanistê ne bûya".

Lê tiştê balkêştirîn, li gor nêrîna min navê (islamê) ye, an go aşitî, ev nav bi xwe ji bo rastî yê reşkujtine, ji ber ku peyvek sexteye rastiyê ji hev belav dike û vedişêre, ewên, islamê di bin ol û dirûşma xwedayek li asîmane û xelîfeyek li erdê ye şerên dijwar û xwîndar li dijî mirovahiyê pêkanîn, weke îro Daîş ku li rojavayê kurdistanê pêk tîne, li dijî miletê kurd di bin heman ol û dirûşman de.

Taha Husên di pirtûka xwe de ya bi navê" Xulefaa Elraşidîn" wiha nivisî ye:

Muhemmed ji partîzanên xwe re bi hêvotin digot: eger dema dijmin ji we xurttir be, dîlên wan yên di destê xwe de serjêbikin.

Ji ber vê yekê dema Daîş wan kiryarên kirêt dike û hêsîran serjêdike ne ji valatiyekê tê, belê ji binçîneya wê çand û davokê ve hatiye.

Di dûmahiyê de ez dixwazim peyvînek ramangerê kurd Abdullah Ocalan bînim ser ziman ku têde wiha dibêje: eger islam nebûya wê Urûba jî neba û eger Urûba nebûya wê Baas jî neba û eger Baas nebûya wê Seddam û Beşar jî nebûna.

Her di vê rê de feylesûfê yehûdî Spînoza wilo dibêje: azadî zanistiye û penda gelê kurd jî gotiye: dîtin û gotin nabin yek...

"ENKS"ê, Çareya Aştiyane Bikar Anî... Goka Xwe Avête Gastîna "Tev-Dem" De

Baz Elî Begarî

Ji destpêka nakokiyên di nav her du hêzên Kurd de, li Rojavayê Kurdistanê, hewldanên rêkfetina di nav wan de destpêkirin, û bi taybet insiyatîfên serokê Herêma Kurdistanê (Başûrê Kurdistanê) Mesûd Barzanî, di encama wan hewldanan de, rêkeftinên Hewlêr û Duhokê hatin imzekirin, lê ew rêkeftin jî negihiştin serî, û her aliyekî yên din bi têkbirina rêkeftinan tewanbar dike.

Niha Tev-Dem piştî ragihandina Rêveberiya Xweser a Demoqratîk, bi hêzên xwe yên siyasî, leşkerî, û ewlehî û wek desthilat xwe ragihand. Beramberî vê, ENKSê û hin partiyên din tevlî Rêvebiriya Xweser nebû, û wek partiyên siyasî qedexekirî destnîşan bûn, jiber ewan destûra Rêveberiyê bo çalakiyên xwe nestandin, û ew nexwedî hêzeke leşkerî ye.!

ENKS'ê tiştê di destê wê de, çalakiyên sivîl û aştiyan ne, lê ji ber girtin, û dûrxistina endamên wê ji rojava li ser destê asayîşa Rêveberiyê, karê wê jî êdî asteng bûye.

Niha em li ber du hêza ne, yek bi çek û dezgehên xwe yê ragihandinê xwe ye, û li aliyek din hêza din tenê dikare bi daxuyanî û mangirtin û xwepêşandanan himber wê derkeve.

Alîgirên her du aliyan, bi şêweyê gelêrî dixebitin, ku hev xayin derdixînin, û nakokî û cudabûn di civakê de roj bi roj pirtir dikin, di di djberiyê wan de, ENKS'ê rêbaza aştiyane bikar anî, himber çareya ewlhî ya Rêvebiriya "Tev-Dem"ê.

Şaştî û çewtiyên her du aliyan hene, Ku ENKS'ê heta vê demê, helwesta wê di hindirê Hemahengiya Rikberiyê ya Sûrî ku Tev-Dem wek dijimin dibîne, ne diyar e, partiyên di hindirê ENKSê de lihev nakin, cudahî di nav axaftinên ENKSê di hindir û derve de hene, nexasim rêxsitinên bi ser wê ve li Ewripa ku tenê dijberiya Tev-Dem ji xwe re kirine kar, û arîşeya Kurdî bigiştî jibîr kirine, û tevî wan têbîniyên ku her dem me dida rûyê ENKSê, û ji berî ku rewş weha aloz bibe.

Li aliyeke din Tev-Dem ku roj bi roj sîstema wê dibe sîstemek asê li dijî jiyana siyasê di rojavayê Kurdistan de, bi rêgirtina wê himber çalakiyên sivîl û polîtîk yên hêzên dijberî wê û bi taybet ENKSê, dezgehên Rêveberiyê ta niha li xwe na nerin ku ew desthilat in, û divê li hemî welatiyan binerin ku ew wekhevin, dûrî ramanên wan, û ev ne di hemî dezgehan de heye, lê piranî weha ne, Rêveberî heta niha projeyê wê ne diyar e, ku ew rêveberiyek Kurd de, an rêveberiyeke Sûrî ye, û navnetewî ye?!

Ji bo her kes vê zanibe ku her du alî dema berê xwe didin alîgirên xwe, tenê behsa Kurdewariyê, û pêkanîna xewna Kurdî dikin, û xwe pêşkêş dikin ku ew siwarên hespê azadiya Kurdistanê ne, lê dema tu daxuyanî û axaftinê serkirdeyên wan di civînên mezin li ser asta Sûriyê, û herêmê û navdewletî dibîne û dixwîne, tenê ew dibin xwedî projeyek nîştimanî Sûrî, û doza mafê Kurdan di Sûriyê de dikin.

Ev lîstika bi hestên gel her du aliyan bikar tînin, lê rastî ku her du alî jî Kurdistanan ava nakin, ez nabêjim divê Kurdistnan ava bikin, çimkî lîstik navdewlatî ye, û eger rêkeftin li ser avakirina Kurdistanê çê nebin, ti hêz nikarin vê yekê pêkbîn in, lê ya girîng ku her du alî bi rastî ligel

alîgirên xwe biaxivin.

Nakokî berdewam in, û xiyanetkirin jî berdewam in, lê eger Rêveberiya xweser rastî xwe desthilat dibîne, û rastî xwe demoqrat dibîne, weke ku radighîne, divê ew bi gelê xwe re rast be, û her weha bi nirxên xwe re jî rast be, ku bi rastî jiyana siyasî li devera wê dijî û sax e, ne demoqratiya wê jî bo hin kesan be, û ji layengerên dir asteng be. Partiyên ENKS'ê xwedê alêgir û cemawer in, û partiyên wê ji mêj ve di Rojavayê Kurdistanê li himber rêjîma Be'esê derdiketin xwepêşendanan, û xebatek wan heye, û himber vê yekê jî ENKS'ê jî divê baweriyê bi "Tev-Dem" 'ê, bike, jiber niha hale hazir ew xwedî hêz ûdezgehe nexasim li ser zemîna xwe û hin zemînên di di Sûriyê de.

ENKSê bi hilbijartina çareya çalakiyên sivîl û xwepêşandan gog xist lîstikgeha Tev-Demê de, û dive Tev-Dem çavê xwe ji vê yekê negire, û netenê dengê awazên xwe bike, çimkî ew ne tenbûrvana bi tenê divê holê de ye, û eger wê guhê xwe girt, dê awazên wê jî nexweş derkevin, û wê her du alî cemawer dûrî xwe bixin, eger aheng tev de xera nekirin!!

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Cegerxwîn.. Jiyan û Berhem 1903-1984

Ji malbateke gundî belengaz, helbestvanê kurd ê nûjen Cegerxwîn sala 1903an de li gundê Hesarê yê ku li Bakurê Kurdistanê hatiye dinê. Navê wî Şêxmûse kurê Hesenê Mihemedê Mehmûdê Elî ye. Qey qederê wisa dixwest, ku Cegerxwîn jiyaneke zor û zehmet derbas bike, dema dê û bavê wî mirin û sêwî ma. Vêca ji neçarî bû şivan û paleyî jî dikir. Lê Cegerxwîn zû bi zû ji vê rewşê derket û berê xwe da zanistiyê, li cem şêx û melan li zanînê geriya, dest bi xwendina feqetiyê kir. Heft heşt salan bi vî awayî xwendin bidawî kir û (îcaza) xwe li cem Mele Fethule stand, piştre hinekî meletiya gundan kir. Du bûyerên mezin di herêmê de çêbûn, ev bûyer bûn sedemên guhertinê di kesetiya Cegerxwîn de, berê wî bi xurtî ber bi nîştimanperweriyê de dan:

-Cenga Cîhanî ya yekem û tiştên jê veketin, mîna serxwebûna gelên bindestê Turkan û peymana taybet bo Bakur a ku bi navê (Sîver) tê nasîn û leystikên Turkan dijî wê peymanê.

-Heriftina şoreşa Şêx Se`îd 1925an de, û di pê re çavsoriya ku li gelê kurd kirin. Bi kuştina hezarên şoreşgêran. Hema bi sedan ji wan şoreşgêran gihiştin Sûriyê. Ewan şoreşgêran di sala 1927an de komeleyek bi navê Xoybûn saz kirin. Cegerxwîn tevlî vê komeleyê bû, û bû yek ji endamên wê.

Di vê demê de Cegerxwîn dest bi nivîsandina helbestê kir û di kovara Hewarê de helbestên xwe diweşandin. Piştî serkeftina şoreşa Iraqê sala 1958an, Cegerxwîn derbasî Iraqê bû, û li zankoya Bexdê di beşa wêjeyê de xwend. Di sala 1963an de, ji naçarî dîsa vegeriya Sûriyê, ta sala 1979an û di wê salê de berê xwe da Siwêdê û li bajarê Stokholmê cîwar bû. Di 22 Çiriya Pêşîn de, sala 1984an de. Li bajarê Stokholmê dilê wî rawesta û çû dilovaniya xwedê. Kesekî mîna Cegerxwîn tekê zemanê xwe bû. Bi hiş û ramanê xwe, bi bîr û bawerên xwe, nîştimanperwerekî bêhempa, di nêv miletekî nezan û perîşan de, ku bi sedê salan zilm û zordariyê dikêşe. Cegerxwîn ev rasteqînî baş dizanî, ji ber ku gelek bûyerên mezin di Kurdistanê de li ber çavên wî çêbûn, vêca giha encamekê ku, miletê di vê rewşa xirab de bijî, divê mirov bêhnê lê fireh bike, hin bi hin mirov wî bighîne baweriyên zanistî, girêdanekê di navbera wî û doza azadiyê de pêk bîne. Lê carna bê hêvî dibû û digot: (gulek nake buhar). Lê di dema niha de neviyên Cegerxwîn bîr û baweriyên wî di dilê xwe de çandin, û li ser rêça wî gavan tavêjin. Di dawî de em dikarin rastiya vê helbesta wî berbiçav bikin dema dibêje:

Meyger tu bîne ez li dinê her wekî fîl im
Şûva ku me ajotiye tovê xwe biçînin

Mizgîn li te be me tovê xwe çand û gelekî nêzîk ewê kat bide!

Berhemên Cegerxwîn

Helbest:

Dîwana yekem: Prîsk û Pêtî, 1945 Şam
- Dîwana duyem: Sewra Azadî, 1954 Şam
- Dîwana sêyem: Kîme Ez? 1973 Beyrûd
- Dîwana çarem: Ronak, Weşanên Roja Nû 1980
- Dîwana pêncem: Zend-Avista, Weşanên Roja Nû19
- Dîwana şeşem: Şefeq, Weşanên Roja Nû 1982
- Dîwana heftem: Hêvî, Weşanên Roja Nû 1983 Stockholm
- Dîwana heştem: Aştî, Weşanxana Kurdistan 1985 Stockholm

Wergerên wî:

- Kurd. Basîl Nîkîtîn
- Mînoriskî
- Leyla û Mecnûn
- Ûsiv û Zelîxe
- Çîroka Xortê îranî
- Dewleta Mahabadê
- Kêferat Li Ser Kurdistanê, Xalifîn
- Baqismatê Reş

Dîrok:

- Çend Şoreşên kurdên kevnare
- Destûra Kurdistanê
- Dewleta Eyûbî Li Yemenê
- Tarîxa Benî Eyûb perçê 1
- Tarîxa benî Eyûb perçê 2
- Tarîxa Benî Eyûb perçê 3

Seydayê Cegerxwîn bi kurtî jiyana xwe di riya helbestek xwe de hûnandiye:

Ziman û Ferheng:

-Destûra Zimanê kurdî, 1961 Bexda
- Ferheng, perçê yekem,1962 Bexda
- Ferheng, perçê diwem,1962 Bexda





"Bi Kurtî Jîna Min"

Sala hezar û nehsed û sê ez hatim dinyayê
Bi navê Siltan Şêxmûs ez çêbûme ji dayê.
Heta bûm sêzde salî li gundê me'y Hesarê
Jîna xwe min diborand, paşê ji wê me da rê.
Bavê min î rîsipî, xwedî mirov û rûmet
Ne mirovek malgenî, bi namûs û bi xîret.
Ji tengasî, neçarî me ew gundê xwe berda
Hatin Amûda rengîn, bavê min zû emir da.
Diya min a belengaz, pêncî salî, dilovan
Salek piştî bavê min, ew jî li wî bû mêvan.
Birayê min nîvmela ji alema ronahî
Rast û dirist ku bêjim, ew tiştekî nizanî.
Wî pîreka xwe anî, bê wijdan û bê mejî
Bi gotinên xwe ên çors, ew min bêderb dikujî.
Xwişka min a xemnexwar, bê insaf û bê wijdan
Ez reviyam hatim cem, wê jî ez kirim şivan.
Geh li vir û geh li wê, min ezabek mezin xwar,
Ya Elah û ya Xwedê, paşê bûme xwendewar.
Jîna min ya kevnare, êdî hate guhertin
Tev xweşî û zanebûn, heft heşt salan hin bi hin.
Min dest bi kurdiyê kir, peyda kirim çend mirîd
Bi xweşxan û reşbelek xesma piştî Şêx Seîd.
Paşê çûme Iraqê, ji wê ez çûme Îran
Heçî kesê bidîma, ji min dimane heyran.
Berî sala rehmetî, bi Çar salan " Dilbirîn ",
Di şi'rê de navê xwe min datanî " Cegerxwîn."
Min îcaza xwe sitand bi serbestî, mêranî,
Ji nû keça xalê xwe, ji Hesara xwe anî.
Bûn melayê Hazda jor, cibepoş û ser bi şaş,
Ji nû riya rast û xweş, bû serjor û rêl û kaş.
Min bi dûvê dinê girt, vîna wê ket dilê min,
Barê gund û ê kuflet, hemî ket ser milê min.
Paşê hate bîra min ku ez bibim xwedî gund,
Dilê min jî gote min " gelek baş e, gelek rind."
Min ji axa Cizîrê, du gund kirin kul û xem,
Navê yekî Çêlek bû, ê din me kir Cehenem.
Di nav me de nemabûn, ne axa û ne kêfxwe,
Elo, Celo, Kumbiqul, min tev kirin wekî xwe.
Roja me gund ava kir, kete rastê mixtarî,
Gundên me bûn berberî, dijminahî, neyarî.
Tevan girtin darên xwe, bûne weke gurên har,
Ji wî bextê min ê reş, kurê Potê bû mixtar.
Sermiyanê wî derew, li ser wî bû berberî,
Wek Duçeyê talyanî, paşê wî bi xwe de rî.
Xwedî mal û xwedî gund, li bergîlê bû siwar,
Rê xiste mala xwe, Tiro! Paşê bû etar.
Piştî ilmê xwe ê pir bûm Dodoyê qulungvan
Bûm hevalê Kumbiqul, kurê potê sermiyan.
Ev cîhana xapînok, heta min xwe jê nas kir,
Çikim fêde nemaye, emrê xwe min xelas kir.
Ji bo rastî dibêjim, li nav dîna bûme dîn,
Heta bimrim ji nû ve, xelk dê bêjin Cegerxwîn